Agirê sînema Amûdê hêjî geş e!

Besam Mistefa

Zêdetirî 40 salan di ser agirê sînemeya Amûdê de bihurîn, sedan zarokên kurd ko paşeroja wan ji wan hate dizîn, hatin kuştin, hatin perçiqandin li kêleka girê Şermolayê di bin axa ko ji asîmanê tawanbaran paqijtir û pîroztir e, dirêjkirî ne. Dilên dayikên wan ev 40 sal in mîna ko bi agirê sê dojehan be, têne sotin: kezeb şewitîn, laş bûne ardûman, û bihn bi ser Amûdê ket, bihna kizirandin û kîna bêhempa! Şermolayê ji hingê ve bêdeng li laşên piçûk temaşe dike û ji xwe re dibêje:Ew çi dil bûn yên ko karibûn van dilên piçûk da nav êgir de bisojînin?!

Wê rojê di salên 60-î de ji sedsala bihurî, sedan zarokan berê xwe dane sînemeya bajêr ya tenha da ko li filmekî li ser şoreşa Cezayirê temaşe bikin. Nizanîbûn ko çi li benda wan e… Dê çawa bizanibin û mêjiyê zaroktiyê pilan û kirêtiya mezinan bibîr nabe?! Dê çawa bizanbin ko welatê ew çûbûn piştgiriya şoreşa wê bikin piştî 15 salan planeke din ya giran û wêranker li birayên wan yên li aliyê din yê sînor girêbidin û hêj nizanin ko sînor yan welat çi ne?! Zarok bûn, bi ken û girinjînan berev sînemê ve diçûn da ko tiştekî nû bibînin û dema vegerin malên xwe çîrokê ji bav û dayikên xwe re biseridînin.

Wê rojê, bajarê Amûdê çîroka xwe ya mezin ji erd û asîmanan re digot: li kurdan qewimî, mîna ko kurd ji êş û şewatan re hatibin afirandin… sînemeya sêwî, ya teng û ne amade ji pêşkêşkirina mirinê pêve bû ejdeha û agirê xwe virde wirde belav kir û dest bi nêçîrkirina zarokên kurdan kir, weke dêwekî sêserî laşên nerm û piçûk daqurtandin, parçeyên laşên şewitî li wan deveran belwela bûn û yên ko xwe ji agir rizgar dikir û digiha derve, rastî "bîra qedrê" dihat û dibû para ava kûr. Dengê zarokên xapandî bi ser amûdê ket, xirecir bilind bû, xelkên bajêr vecinqîn: "Xwedayê min, Ev kurdên te ne , xwedayê min!" Bavê Fehed ê ko bajêr pê hate naskirin piştî şewatê berev sînemê ve çû. jêre gotin:qey zarokên te jî li wir hene?li wan vegerand: "Zarokên kurdan tev yên min in " û çû. pêşî polîsên ko dergeh li zarokan digirtin û qerebalix pirtir dikirin bi tena xwe ji wir dûrkirin û xwe berda nav agir, çend zarok ji agir rizgarkirin û ji nişkê ve agir girte laşê wî…. û ew di nav pencên xwe de quvaşt û ji hestiyan pêve tiştek nehişt. Agirê geş dused ta sêsed zarokî nêçîr kir ji bilî birîndaran.

Wê rojê, bihna kizirandina laşê zarokên Amûda bavê Mihemmed li seranserê bakur belav bû. Dûman jî heta çend rojan asîmanê deverê reş û xemgîn dikir, jixwe agirukjên bajarê ko dor 30 kîlomitrî ji Qamişlokê dûr e tunebûn wê çaxê û heta ko laşên ter û nerm nebûne hestî ew negihştin! Wê rojê, romdik hema hema ji çavan dihatine xwarê, dayikan pora serên xwe anîne xwarê li ser kezebên ko bi berekta ideoljiya faşîstên efleq û beesê masûlke masûlke û parçe parçe hatine sotin û kuştin. wê rojê, xwedê ji jor li afirînerên xwe dimeyzand: Ma min wisa ji we re gotibû!

Wê rojê, girê Şermolayê ku dîroka Amûdê bi ax û bêdengiyê dinivîse ,xwe negirt û heta jê hat hewilda ko xwe bighîne Amûdê û zarokên wê ji agirê bêbext xilas bike, lê zarok bixwe hatine nik wê û li kêleka wê heta haetayê xwe dirêj kirin: Êdî ji jiyana mezinên kirêt û pilanger xilas bûn, û niha dikarin bê tirs, bê agir û şewatan xewnên xwe bi teşiyên hêviyê bihûnin.